# Piştevanîya Mirovan

## Heke hun li ser piştevanîya ji we re pêwîst bêtir agahî bixwazin, hun ê bi kê re têkilî çêbikin

**Piştevanîya Mirovan a Şaredarîya Haringey dixwaze alîkarîya mirovan bike ku li xwe binêrin û heta ku ji wan tê serbixwe bin.**

www.haringey.gov.uk

### Em dikanin ji bo van probleman alîkarîya we bikin.

Dibe ku hun dixwazin hun cîhekî bibînin ku lê bijîn an jî malekê ava bikin.

Dibe ku hun bi jixênîderxistinê tên tehdîtkirin.

Dibe ku hun nikanin kirêya xwe bidin û ji ber îhtîmala mecbûrî terkkirina mala xwe mayinê fikaran dikin.

Dibe ku problemên we yên li xwe nêrînê hebin an jî ji bo lixwenêrînê ji we re alîkarî divê.

Dibe ku hun bi tena xwe dijîn û pêwîstî dibînin ku kesek were serdana we û bicîh bike ku di ewlehî û xweşîya we de pirsgirêk tunin.

Dibe ku hun xanîyê bi piştevanî dixwazin.

Dibe ku hun li malê xwe ewle his nakin û alarmekê dixwazin ku, dema ku ji we re pêwîst be, hun wê bikar bînin.

Dibe ku pêwîstîya we bi bêtir alîkarîyên sosyalê hebe û hun nizanibin ku wan çawa bidest bixin.

Piştevanîya Mirovan dikane ji bo piştevanîya xênî, bikaranîna xizmetên lênêrîna tendurustî û perwerdê alîkarîyê bike.

## Ji bo alîkarîyê biçin kuderê

Ev lîsta pirsan divê ji bo xizmeta piştevanîyê ya Piştevanîya Mirovan rêberîya we bike. Ji kerema xwe kitkitên têkilîyan bikar bînin, da ku hun bi xizmeta li gora xwe re têkilî çêbikin.

Ji bo agahîya li ser hemû yelpazeya xizmetên ku Şaredarîya Haringey peyde dike, ewên ku bi rêya Piştevanîya Mirovan tên pêşkêşkirin jî di nav de, li websîteya me binêrin:
www.haringey.gov.uk
an jî bi şêwridarekî miştêrî yê me re bipeyivin: 020 8489 0000.

**Hun an jî merivekî we ji NHS an jî Xizmetên Civakî ji bo pêwîstîyên tendurustîya heş alîkarîyê distînin û ji we re şêwirdarî yan piştevanî divê?**
**Têkilî: Karmendê Avakirina Cîhên Lêmayinê**
Haringey Council
40 Cumberland Road
Wood Green
London N22 7SG
020 8489 3772
www.haringey.gov.uk

**Hun kal an pîrek in an seqetîyeke we heye û pevxistina tiştên li malê ji bo we zehmet e, an jî ji bo bexçevanîyê ji we re alîkarî pêwîst e?**
**Têkilî: Lênêrîn û Tamîra Metropolîtan**
020 8829 8310

**Bi we re kêmasîyeke hînbûnê heye û ji we re maleke xwe ya bi piştevanî pêwîst e?**
**Têkilî: Hevparîya Dijwarîyên Hînbûnê ya Haringey**
Unit 5, St George's Estate
White Hart Lane
London N22 5QL
020 8489 1384

**Hun ji 60 salî meztir in û ji we re xanîyê bi piştevanî an sitargeh divê?**
**Têkilî: Tîma Nirxandina Xanîyên bi Piştevanî**
Haringey Council

Woodside House
294 High Road
Wood Green
London N22 8YX
020 8489 2301

**Heke hun terka lênêrîna şaredarîya herêmê dikin û 16 salî bin an jî nêzîkî li 16 salî dikin, û pêwîstîya we bi şêwirdarî û piştevanîya xanî hebe.**
**Têkilî: Birêvebirê Tîma Cîhên Lêmayinê**
The Children and Young People's Service
Compton Crescent
London N17 7LD
020 8489 5823

**Tehdîta ji xanî derxistinê, bêxanîbûnê li ser we heye, an jî li malê problemên we hene?**
Heke hun di navbera 18 û 60 salî de bin û ku:

- cîhekî we yê lêmayinê tunebe
- pêwîstîyên we yên tendurustîya heş hebin
- hun narkotîkan bikar tînin an jî alkolê yekcar zêde vedixwin
- hun sûcdarek an jî kevnesûcdarek bin
- an jî meriv an hevalekî we bi HIV an Aids be
- hun ciwanek in, malbat û hevalên we tunin ku li pişt we derkevin û pêwîstîya we bi şêwirdarî û piştevanîya xanî heye
- hun li ewlehîyê gerîyane û hatine vî welatî, û wek penaber hatine naskirin.

**Têkilî: Tîma Mezinên Rewş-xesas**
Haringey Council
Apex House
Tottenham
London N15 5PQ
020 8489 4293
www.haringey.gov.uk

**Hun mexdûrê sûcekî ne? Hun bi tena xwe dijîn? Hun ditirsin ku, dibe ku qezak li we biqewime û hun nikanibin banga alîkarîyê bikin?**
**Têkilî: Tîma Ewlehî û Serastîyê**

020 8489 2365

**Hun rûbirûyî tundkarîya nav malê bûne û ji we re li ser ku hun ê ji bo ewlebûn û bidestxistina alîkarîyê bi ku de herin, piştevanî û şêwirdarî divê?**
**Têkilî: Navenda Tundkarîya Nav Malê û Piştevanîyê ya Hearthstone**
020 8888 5362

**Hun ciwanek in, û ji we re ji bo xanî, perwerde an kardîtinê piştevanî û şêwirdarî divê?**
**Hun, merivek, an hevalek dikanin têkilî çêbikin li gel:**
**Connexions Advisors**
Haringey Council
Apex House
820 Seven Sisters Road
Tottenham
London N15 5PO
020 8489 4255

**Piştevanîya Mirovan her weha xizmetan pêşkêş dike ku li malên wan alîkarîya mirovên herêmê bike.**
Em dikanin ji bo dîtina lênêrîna tendurustî, perwerde, perwerdeya kar alîkarîya we bikin, û heke hun bixwazin li ser xizmetan agahîyê bidest bixin an jî bi zimanekî cuda agahîyê bistînin wergêran pêşkêş bikin.

**Piştevanîya Sereke** ji bo azib û cotên bê zarok:
020 8347 2327

**HARTS** ji bo malbatan:
0845 303 2350

**Sixty Plus** ji bo mirovên 60 salî an meztir:
0800 652 6100
020 8275 4300

Ji bo bêtir agahîya li ser xizmetên Piştevanîya Mirovan û belavokên ku peyde dibin, têkilî:
**Supporting People Programme**
40 Cumberland Road
Wood Green
London N22 7SG

020 8489 3344
supporting.people@haringey.gov.uk